



RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ

Komxebata Kurmancîyê



<https://zanistvan.wordpress.com/>

KANÛNA PAŞÎN - 2018

WEQFA MEZOPOTAMYAYÊ

Di alfabeya kurmancîyê da 31 tîp hene.	
Girdek:	A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V W X Y Z
Hûrdek:	a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z
Dengdêr:	a e ê i î o u û
Nedengdêr:	b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Bilêvkirina tîpên nimênendeyên nedengdêran.											
B	C	Ç	D	F	G	H	J	K	L	M	N
be	ce	çe	de	fe	ge	he	je	ke	le	me	ne
P	Q	R	S	Ş	T	V	W	X	Y	Z	
pe	qe	re	se	şe	te	ve	we	xe	ye	ze	

Navên mehan li gor demsalan ev in:			
Mehên zivistanê	Mehên biharê	Mehên havînê	Mehên payîzê
kanûna pêşîn	adar	hezîran	îlon
kanûna paşîn	nîsan	tîrmeh	çirîya pêşîn
sibat	gulan	tebax	çirîya paşîn

Tîpa ducare û awarte	
Weha binivîse	Weha nenivîse
ber (kilîm)	berr
birîn (= qut kirin)	birrîn
ker (= yê/ya ku nabihîze)	kerr
pir (= gelek)	pirr

Tipen ducare yen bejeyen ji zimane erebi	
Weha binivîse	Weha nenivîse
cebar	cebbar (جَبَّار)
ced	cedd (جَدَّ)
cenet	cennet (جَنَّة)
cerah	cerrah (جَرَّاح)
cidî	ciddî (جَدِّي)
delal	dellal (دَلَّال)

Gava ku bi pêşgîrekê bêjeyeka nû bihê çêkirin, divê ku tîpa ducare bimîne.	
bê + êl — bêêl	mirovê bêêl
bê + êm — bêêm	hespên bêêm
bê + êş — bêêş	emelîyata bêêş
ne + erzan — neerzan	qumaşekî neerzan

Li gel paşgîra berawirdî, divê ku tîpa ducare bimîne.		
Nimûne:	Weha binivîse	Weha nenivîse
kort + tir	korttir	kortir
rast + tir	rasttir	rastir
sert + tir	serttir	sertir
xurt + tir	xurttir	xurtir

Divê ku [d]ya berî [t]yê bihê parastin.		
Nimûne:	Weha binivîse	Weha nenivîse
bilind + tir	bilindtir	bilintir
merd + tir	merdtir	mertir
rind + tir	rindtir	rindtir

Gava ku ji du bêjeyan bêjeyeka nesade bihê çêkirin.

Nimûne:	Weha binivîse	Weha nenivîse
dest + teng	destteng	desteng/desteng
kiras + sor	kirassor	kirasor
ser + rût	serrût	serût
yek + kête	yekkîte	yekîte
ziman + nasî	zimannasî	zimanasî

Gava ku ji du bêjeyan bêjeyeka nesade bihê çêkirin, divê her du tîp jî bihên nivîsîn.

Nimûne:	Weha binivîse	Weha nenivîse
dest + teng	destteng	desteng/desteng
kiras + sor	kirassor	kirasor
ser + rût	serrût	serût
yek + kête	yekkîte	yekîte
ziman + nasî	zimannasî	zimanasî

Di navdêrên lêkerî da

Lêker	Navdêrên lêkerî	
	Weha binivîse	Weha nenivîse
agir rijandin	agirrijandin	agirijandin
dar rakirin	darrakirin	darakirin
li ber rabûn	liberrabûn	liberabûn
şer rawestandin	şerrawestandin	şerawestandin

Nivîsîna bêjeyên ku bi “-stan”ê dihên çêkirin.

Weha binivîse	Weha nenivîse
Bûlgaristan	Bulgarîstan/Bûlgarîstan
Efxanistan	Efxanîstan
Erebistan	Erebîstan
Ermenistan	Ermenîstan
Gurcistan	Gurcîstan
Hindistan	Hindîstan
Kurdistan	Kurdîstan
Pakistan	Pakîstan
Tacikistan	Tacikîstan
Tirkmenistan	Tirkmenîstan

Bêjeyên bîyanî ku bi [i]yê dest pê dikin, [i]ya wan ya destpêkê dibe [î].

Weha binivîse	Weha nenivîse
îbret	ibret
Îbrahîm	Ibrahîm
îflas	iflas
Îhsan	Ihsan
îmkan	imkan
îmtihan	imtihan
îmtiyaz	imtiyaz
îmza	imza
înkâr	inkar
însaf	insaf
însan	insan
Îsmaîl	Ismaîl
Îşaret	işaret

Nivîsîna [î]ya berî [y]yê	
Weha binivîse	Weha nenivîse
(azadî) azadîya Kurdistanê	azadiya Kurdistanê
(derzî) derzîya min	derziya min
(gundî) gundîyên me	gundiyên me
(kuştî) kuştîyên me	kuştiyên me
(xanî) xanîyê me	xaniyê me

Nivîsîna [ê]ya berî [y]yê	
weha binivîse	weha nenivîse
(dê) dêya min	diya min/ dîya min
(pê) pêyên min	piyên min/ pîyên min
(rê) rêya dirêj	riya dirêj/ rîya dirêj

Li peyvên dunavdêrî, peyva ku hejmara kêteyên wê kêmtir e, bi giştî berê dihê gotin û nivîsîn û ya din jî piştî [û]yê dihê gotin û nivîsîn.

ba û baran
dev û diran
dem û dewran
dek û dolab
zar û ziman
çûn û hatin
dan û standin
dîk û mirîşk
ken û girî
kêm û zêde
ap û birazî
xal û xwarzî
def û zirne
çerm û hestî
hûr û rovî
rih û simbêl
ta û derzî

Girdek di rewşên jêrîn da dihên bikarînan.

Di destpêka komekê da	Min bêriya welatê xwe kiriye.
Piştî cotxalê	Wan got: “Bimire koletî!”
Nav û paşnavên kesan	Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Memê Alan
Nasnav û leqeb	Azadê Çavlihewa, Behramê Kej, Soro
Navên qehremanên çîrokan	Keçika Kibrîtfiroş, Mîr Mihemed
Navên xweda	Xweda, Yezdan, Zeûs
Ferîşte, pirtûkên pîroz û cihên dînî	Cebraîl, Avesta, Quran, Mizgefta Pîran, Quds
Navên welat û dewletan	Almanya, Îran, Îraq, Kurdistan, Rûsya, Swêd
Navên bajar, bajarok û gundan	Bazîd, Cizîr, Mêrdîn, Pîran, Semsûr, Şernex
Navên tax, kolan û meydanan	Kolana Azadîyê, Meydana Çarçirayê
Navên parzemînan	Afrîka, Amerîka, Antarktîka, Asya, Ewropa
Navên okyanûs, derya û kendavan	Okyanûsa Atlasê, Deryaya Reş, Kendava Adenê
Navên çeman, deştan, çiyayan	Çemê Feratê, Deşta Mûşê, Çiyayê Agirîyê
Navên kovar, rojname, pirtûkan	Kovara Jînê, Rojnameya Kurdistanê, Dersên Kurdî

Tewang

Tiştêya lêkera têper ya di dema niha da:	Ez hespî dibînim. Ez mehîne dibînim. Ez zarokan dibînim.
Bikera lêkera têper ya di dema borî da:	Hespî ez dîtîm. Mehîne ez dîtîm. Zarokan ez dîtîm.
Dîyarkera di konstruksiyona îzafeyê da:	wêneyê hespî wêneyê mehîne wêneyê zarokan
Piştî cihnavên nîşandêr:	vî hespî vê mehîne van zarokan
Li gel daçekan:	li malê ji bajarî li ser xanîyî li bin maseyê li gor kitêbê di bêrikê da ji zarokan ra

Tewanga navdêrên nêr yên yekhejmar:	Ez bajarî (bajêr) dibînim. Ez di çemî (çê) ra derbas bûm. Ez Şêrkoyî (Şêrko) dibînim.
Navdêrên nêr yên yekhejmar û nenasyar:	Ez diranekî radikim. Ez kurekî dişînim. Ez derîyekî vedikim.
Tewanga navdêrên mê yên yekhejmar:	Ew ji Mûşê ye. Ez pîvazê dixwim. Ew ji bêrîyê dihê.
Navdêrên mê yên yekhejmar û nenasyar:	Ez mehînekê dibînim. Ez sêvekê dixwim. Ew li ser rêyekê ye.
Navdêrên her du zayendan yên pirhejmar:	Ez bajaran dibînim. Ez dibistanan dibînim. Ez nameyan dişînim.
Navdêrên her du zayendan yên pirhejmar û nenasyar:	Ez hin bizinan dibînim. (Ez bizininan dibînim.) Ez hin derîyan dibînim. (Ez derîyan dibînim.) Ez hin hespan dibînim. (Ez hespinan dibînim.)
Navdêrên ji yek mêjerê lê ji zayendên cuda:	Ez mih û beranî dibînim. Ez nêrî û bizinê dibînim.
Navdêrên ji yek mêjerê û ji yek zayendê:	Ez hesp û beranî dibînim. Ez mehîn û bizinê dibînim. Ez nêrî û beranî dibînim.
Navdêrên mêjercuda:	Ez hespî û mehînan dibim malê. Ez mehîne û beranan difiroşim. Ez hespî û nêryan dibînim.
Navdêrên pirhejmar lê ji zayendên cuda:	Ez mih û beranan dibînin. Ez dîk û mirîşkan dibînim. Ez bizin û nêryan dibînim.
Bêjeyên ku bi “-an”ê diqedin	Ez Botanî (kurek) dibînim. Min ji Botanî (kurek) ra got. Ez dê biçim Botanê (deverek). Ez ji Botanê (deverek) hez dikim.

Îzafe	
Navdêrên nêr yên yekhejmar û nasyar	hespê boz hespê min gayê malê
Navdêrên nêr yên yekhejmar û nenasyar	derîyekî mezin derîyekî xanîyî diranekî min hespekî malê
Navdêrên mê yên yekhejmar û nasyar	mehîna male pêlava min qeleva sor
Navdêrên mê yên yekhejmar û nenasyar	mehîneka male goreyeka min qelemeka sor pencereyeka malê
Navdêrên her du zayendan yên pirhejmar û nasyar	bajarên mezin hespên min çîyayên bilind nameyên min
Navdêrên her du zayendan yên pirhejmar û nenasyar	hin çavên şîn → çavine şîn hin hespên wan → hespine wan hin mehînen boz → mehînine boz hin pencereyên male → pencereyine malê

Nivîsîna cihnavên kesî	
Grûpa xwerû	Grûpa tewandî
ez	min
tu	te
ew	wî/wê
em	me
hûn	we
ew	wan

Nivîsîna cihnavên pirsîyarî	
Grûpa xwerû	Grûpa tewandî
kî	kê
kîjan	kîjanî (di cihê navdêrên nêr da)
kîjan	kîjanê (di cihê navdêrên mê da)
kîjan	kîjanan (di cihê navdêrên pirhejmar da)

Cihnavên pirsîyarî	
Cihnavên pirsîyarî yên grûpa xwerû	Cihnavên kesî yên grûpa xwerû
Kî dibêje?	Ez dibêjim.
Kîjan baş e.	Ew xortê bejindirêj baş e.
Kîjan ji wan dê beşdar bibin?	Ew mamostayên kevin dê beşdar bibin.

Cihnavên pirsîyarî	
Cihnavên pirsîyarî yên grûpa tewandî	Cihnavên kesî yên grûpa tewandî
Kê got?	Min got.
Kîjanî ji wan ji te ra got?	Wî xortî ji min ra got.
Kîjanê ji wan ji te ra got?	Wê xwendekarê ji min ra got.
Kîjanan ew dîtîye?	Wan kesan ew dîtîye.

Nivîsîna rengdêrên nesade
bîra bê binî
derdê bê derman
gelîyên bê dar
çaya bi şekir
gelîyên bi dar
mirovê ne baş
mêrxasê ne mir

Peyvên durengdêrî

baş û xerab
dûr û dirêj
jîr û zana
qenc û xerab
reş û belek
sar û germ
têr û tijî
tî û birçî

Nivîsîna lêkerên sade

Ez kurd im.	Ez swêdî me.
Tu kurd î.	Tu swêdî yî.
Ew kurd e.	Ew swêdî ye.
Em kurd in.	Em swêdî ne.
Hûn kurd in.	Hûn swêdî ne.
Ew kurd in.	Ew swêdî ne.

Lêkerên nesade yên ku bi hevûdin ve dihên nivîsîn.

dagirtin
dagerîn
daxistin
hilgirtin
hilînan
hilkirin
hilkişîn
rabûn
raçandin
ragirtin
raketin
rakirin
raxistin
rûniştin
vebûn
vedan

vegerandin
vegerîn
vegevizandin
vegevizîn
vegirtin
vêketin
vekirin
vemirandin
vemirîn
veqetandin
veqetîn
vexistin
vêxistin
vexwarin
wergerandin
wergerîn
wergirtin

Parçeyên lêkerên ku ji hevûdin cuda dihên nivîsîn.

av dan
avjenî kirin
bang dan
bar kirin
ber dan (berhem dan)
bi cih înan
bi dar da kirin
bi hev ketin
bi hev ve kirin
bi rê kirin
bi ser ve bûn
bi ser xwe ve hatin
dehf dan
deng vedan
ders dan
dest jê berdan
dest pê kirin

dev jê berdan
guh dan
guhdarî kirin
heyf hilînan
hîn bûn
hîn kirin
jê birin
jê çûn
jê ketin
jê kirin
jê man
ji ber çûn
ji ber kirin
ji hev ve kirin
ji xwe kirin
kar kirin
kurt kirin
lal bûn
lê çûn
lê dan
lê hatin
lê înan
lê kirin
lê pirsîn
lê werdan
lê xistin
li hev înan
li hev kirin
li hev pirsîn
li xwe kirin
nimêj kirin
pê hesîn
pê ketin
rêz kirin
şahîk kirin
ser dan

ser jê kirin
serî lê dan
şû kirin
tê dan
tê gihîştin
tê werdan
têk çûn
tol hildan
tûj kirin
vala kirin
xeber dan
xelas bûn
xelas kirin
xerab kirin
zarok înan
zeft kirin
zerhimî bûn
zîl dan

Nivîsîna “dê” ya dema dahatî.

Ez dê bibînim .
Ez dê biçim .
Ez dê bidim .
Ez dê biêşim .
Ez dê bigerim .
Ez dê bigirim .
Ez dê bigirîm .
Ez dê bihêlim .
Ez dê bikenim .
Ez dê bikim .
Ez dê bikujim .
Ez dê bilîzim .
Ez dê bimeşim .
Ez dê bişînim .
Ez dê bişom .
Ez dê bixwim .

Herçî lêkerên nesade ne, bêyî “bi-” yê dihên nivîsîn.

Weha binivîse	Weha nenivîse
Ez dê dagirim.	Ez dê dabigirim.
Ez dê rawestim.	Ez dê rabiwestim.
Ez dê hilkişim.	Ez dê hilibikişim.
Ez dê vexwim.	Ez dê vebixwim.
Ez dê vegerim.	Ez dê vebigerim.
Ez dê çêbikim.	
Ez dê biçim.	

Heger lêker ji çend bêjeyan pêk hatibe.

Ez li ber dikevim .
Ez li ber xwe didim .
Ez pêşkêş dikim .
Ez ser jê dikim .

Bi lêkerên nesade ra

Ew çê dibe .
Ez çê dikim .
Ez da digirim .
Ez da dikim .
Ez hil dikim .
Ez ve digerim .
Ez ve di xwim.
Ez der dikevim .
Ez ra dihêlim .
Ez ra dikevim .
Ez ra dikim .
Ez rû dinim .
Ez ve digerim .
Ez ve dikevim .
Ez ve dikim .
Ez ve dizelînim .

Nivîsîna morfema neyînîyê, Guherteya “ni-” yê

Erênî	Neyînî
Ez dikarim.	Ez ni karim.
Min dikarîbû.	Min ni karîbû.
Ez dizanim.	Ez ni zanim.
Min zanîbû.	Min ni zanîbû.

Guherteya “na-” yê

Erênî	Neyînî
Ez dibînim	Ez na bînim
Ez diçim	Ez na çim
Ez dikujim	Ez na kujim
Ez dipeyivim	Ez na peyivim
Ez dixwazim	Ez na xwazim
Ez dixwim	Ez na xwim

Guherteya “ne-” yê

dema borî	dema dahatî
Ez ne çûm.	Ez dê ne çim.
Min ne xwast.	Ez dê ne xwazim.
Min ne xwar.	Ez dê ne xwim.
Min ne dît.	Ez dê ne bînim.
Ez ne peyivîm .	Ez dê ne peyivim.

Nivîsîna morfema neyînîyê bi lêkerên nesade ra

Rader	Erênî	Neyînî
çêkirin	Ez çêdikim	Ez çê na kim
daxistin	Ez dadixim	Ez da na xim
derketin	Ez derdikevim	Ez der na kevim
hilkirin	Ez hildikim	Ez hil na kim
rabûn	Ez radibim	Ez ra na bim
rawestin	Ez radiwestim	Ez ra na westim
razan	Ez radizêm	Ez ra na zêm
vegerîn	Ez vedigerim	Ez ve na gerim
veşartin	Ez vedişêrim	Ez ve na şêrim

Gava ku rola “ne” yê neyînîkirina temamkera lêkerê be.

Ev jin **ne** yara te ye.

Ew **ne** hevalê min e.

Ew **ne** merd e.

Fransa **ne** germ e.

Mirovê ku serê te diêşîne, **ne** ez im.

Nexweşîya wî **ne** kanser e.

Gava ku rola “ne” yê çêkirina rengdêran be.

Ev jin **neyara** te ye.

Em dê hevalê xwe yê **ne**mir bi bîr biînin.

Mirovê **ne**heq nabêje “Ez neheq im”.

Tu xêr ji mirovê **ne**qenc nahê.

Gava ku biker û tişte navdêr bin.

Weha binivîse	Weha nenivîse
Xwendekarî mamosta gerand.	Xwendekar mamosta gerand.
Xwendekaran mamosta gerand.	Xwendekaran mamostayan gerandin.
Ehmedî Eyşe dît.	Ehmedî Eyşeyê dît.
Eyşeyê heval dîtin.	Eyşeyê hevalan dîtin.

Gava ku biker û tişte cihnav bin.

Weha binivîse	Weha nenivîse
Me tu şandî.	Me te şand.
Me ew şand.	Me wî/wê şand.
Me hûn înan.	Me we îna.
Me ew înan.	Me wan îna.
Min ew dît.	Min wî/wê dît.
Min ew dîtin.	Min wan dît.
Min hûn dîtin.	Min we dît.
Min tu birî.	Min te bir.
Min tu dîtî.	Min te dît.

Te em hêlan.	Te me hêla.
Te ew bir.	Te wî/wê bir.
Te ew dîtîn.	Te wan dît.
Te ez birim.	Te min bir.
Te ez dîtîm.	Te min dît.
Te ez şandim.	Te min şand.
We em şandin.	We me şand.
We em birin.	We me bir.
We ew înan.	We wan îna.
We ew kuşt.	We wî/wê kuşt.
We ew şandin.	We wan şand.
We ez hêlam.	We min hêla.
Wî/Wê ew bir.	Wî/Wê wî/wê bir.
Wî/Wê em înan.	Wî/Wê me îna.
Wî/W ew birin.	Wî/wê wan bir.
Wî/Wê ez înam.	Wî/Wê min îna.
Wî/Wê ez şewitandim.	Wî/Wê min şewitand.
Wî/Wê hûn birin.	Wî/wê we bir.
Wî/Wê tu birî.	Wî/Wê te bir.
Wî/ Wê tu kuştî.	Wî/ Wê te kuşt.

Nivîsîna awayê lêkera tebatî (pasîf).

Weha binivîse	Weha nenivîse
Av hat kelandin.	Av hat kelîn.
Bûk hat xemilandin.	Bûk hat xemilîn.
Pirtûk ji îngilîzîyê hatiye wergerandin.	Pirtûk ji îngilîzîyê hatiye wergerîn.

Formên lêkera “hatin”ê yên bingehîn ji bo *dema niha* ev in:

Weha binivîse	Weha nenivîse
Ez dihêm.	Ez têm.
Tu dihêyî.	Tu têyî.
Ew dihê.	Ew tê.
Em dihên.	Em tên.
Hûn dihên.	Hûn tên.
Ew dihên.	Ew tên.

Formên lêkera “hatin”ê yên bingehîn ji bo dema dahatî ev in:

Weha binivîse	Weha nenivîse
Ez bihêm.	Ez bêm.
Tu bihêyî.	Tu bêyî.
Ew bihê.	Ew bê.
Em bihên.	Em bên.
Hûn bihên.	Hûn bên.
Ew bihên.	Ew bên.

Lêkera têper di konstruksiyona tebatî da

hat avakirin.
hat serjêkirin.
hat jibîrkin.
hat serrastkirin.
hat bidûrxistin.
hat bilêvkin.

Nivîsîna partîsîpên ji lêkerên nesade.

Yên netewandî	Yên tewandî
çarşîya sergirtî	di bîrê da mayî
dewarên serjêkirî	ji bîrê çuyî
gundê wêranbûyî	ji darê ketî
kulîlkên avdayî	ji deryayê derketî
pereyên jibermayî	ji hevalan veqetîyayî
tiştên jibîrkirî	top li malê ketî

Nivîsîna navdêrên ku ji lêkerên sade dihên çêkirin.

Lêker	Navdêrên lêkerî
çûn	çûn (çûna wî)
dîtin	dîtin (dîtina me)
firîn	firîn (firîna çivîkan)
hatin	hatin (hatina mêvanan)
ketin	ketin (ketina te)
kuştin	kuştin (kuştina wî)

Nivîsîna navdêrên ku ji lêkerên nesade dihên çêkirin.

Lêker	Navdêrên lêkerî
guhdarî kirin	guhdarîkirin (guhdarîkirina te)
lê gerîn	lêgerîn (lêgerîna we)
xeber dan	xeberdan (xeberdana me)
bi ser ketin	biserketin (biserketina me)
pê ve kirin	pêvekirin (pêvekirina wê)
ser jê kirin	serjêkirin (serjêkirina mirîşkê)
serî lê dan	serîlêdan (serîlêdana mêvanan)
bi ser xwe ve hatin	biserxwevehatin (biserxwevehatina wê)
li ber xwe dan	liberxwedan (liberxwedana we)

Tewanga navdêrên lêkerî

dema biserxwevehatinê
dema liberxwedanê
dema xeberdanê
encama lêgerînê
pîrozkirina biserketinê
sedema kuştinê
dema biserxwevehatinêkê
dema liberxwedanêkê
dema xeberdanêkê
encama lêgerînêkê
pîrozkirina biserketinêkê
sedema kuştinêkê
encama lêgerînan

îmkana liberxwedan an
pîrozkirina biserketin an
sedema kuştin an
şansa biserxwevehatin an
xweşbûna xeberdan an

Navdêrên lêkerî yê pirhejmar û nenasyar	
encama <i>hin</i> lêgerîn an	encama lêgerîn inan
îmkana <i>hin</i> liberxwedan an	îmkana liberxwedan inan
pîrozkirina <i>hin</i> biserketin an	pîrozkirina biserketin inan
şansa <i>hin</i> biserxwevehatin an	şansa biserxwevehatin inan
sedema <i>hin</i> kuştin an	sedema kuştin inan
xweşbûna <i>hin</i> xeberdan an	xweşbûna xeberdan inan

Îzafe û navdêrên lêkerî	
yekhejmar û nasyar	pirhejmar û nasyar
biserketina kurdan	biserketin ên kurdan
biserxwevehatina nexweşan	biserxwevehatin ên nexweşan
kuştina wî	kuştin ên wan
lêgerîna hikûmetê	lêgerîn ên civaknasan
liberxwedana kurdan	liberxwedan ên kurdan
xeberdana te	xeberdan ên zimannasan

navdêrên mê yê yekhejmar yê nenasyar
biserketine ka hêja
biserxwevehatine ka bilez
kuştine ka xerab
lêgerîne ka baş
liberxwedane ka mezin
xeberdane ka xweş

navdêrên lêkerî yên pirhejmar û nenasyar	
hin biserketin ên kurdan	biserketin <i>ine</i> kurdan
hin kuştin ên wan	kuştin <i>ine</i> wan
hin lêgerîn ên civaknasan	lêgerîn <i>ine</i> civaknasan
hin liberxwedan ên kurdan	liberxwedan <i>ine</i> kurdan
hin xeberdan ên zimannasan	xeberdan <i>ine</i> zimannasan

Pêşdaçekên sade			
bi	bi kêrê	bi te	bi çaran
bê	bê Xezalê	bê te	bê şeşan
ji	ji Mêrdînê	ji te	ji çaran
li	li Dihokê	li te	li heftan

Pêşdaçekên nesade			
li ba	li ba malê	li ba te	li ba çaran
li ber	li ber malê	li ber te	li ber yekê
li bin	li bin maseyê	li bin te	li bin çaran
li ser	li ser maseyê	li ser te	li ser pêncan
li gor	li gor Xezalê	li gor te	li gor çaran
li paş	li paş xanîyî	li paş te	li paş yekî
li pêş	li pêş mamostayî	li pêş te	li pêş yekê
li pişt	li pişt dibistanê	li pişt te	li pişt her çaran
ji bo	ji bo Berfînê	ji bo te	ji bo pêncan
ji ber	ji ber Xanimê	ji ber te	ji ber çaran
ji bin	ji bin xanîyî	ji bin te	ji bin yekê
ji paş	ji paş zilamî	ji paş te	ji paş yekê
ji pişt	ji pişt xanîyî	ji pişt te	ji pişt dehan

Bazinedaçek û nimûneyên wan li jêrê dihên pêşkêşkirin:

bi ... ra	bi Xezalê ra
bi ... ve	bi dîwarî ve
di ... da	di bêrîkê da
di ... ra	di çarşîyê ra
ji ... ra	ji dibistanê ra
ji ... ve	ji alîyekî ve
ber bi ... ve	ber bi malê ve
di ber ... da	di ber malbatê da
di bin ... da	di bin xanîyê da
di ber ... ra	di ber dibistanê ra

Nivîsîna hejmarnavan

Weha binivîse	Weha nenivîse
du mîlyon yan jî 2 000 000	2 mîlyon
1-3, 2-1, 3-0	Yek-sê, du-yek, sê-sifir
Em dê di roja 10an, 17an û 25an da li ser hevûdin 3 caran bicivin.	Em dê di roja dehan, 17an û 25an da li ser hevûdin sê caran bicivin.
çar hezar û şeş sed û pêncî û du ewro yan jî (4 652 ewro)	
Sermayeya şirketê bû 200 000 . Ev 200 000 jî têra berfirehkirina şirketê dike.	Sermayeya şirketê bû 200 000. 200 000 têra berfirehkirina şirketê dike.
Di mîtîngê da 14 kes hatin kuştin û 24 kes jî birîndar bûn.	Di mîtîngê da 14 kes hatin kuştin û bîst û çar kes jî birîndar bûn.
Meaşê wî 400 – 500 ewro ye.	Meaşê wî 4 – 500 ewro ye.
di navbera 400î û 500î da.	di navbera 400 – 500î da.

Hejmarnavên bingehîn

sifir, yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh
yazdeh, duwazdeh, sêzdeh, çardeh, panzdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bîst
deh, bîst, sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, nod, sed, hezar, mîlyon, mîlyar, trîlyon, trîlyar, katrîlyon, katrîlyar, kentîlyon, kentîlyar
du sed, sê sed, çar sed, pênc sed, şeş sed, heft sed, heşt sed, neh sed
du hezar, sê hezar, çar hezar, pênc hezar, şeş hezar, heft hezar, heşt hezar, neh hezar
du mîlyon, sê mîlyon, çar mîlyon, pênc mîlyon, şeş mîlyon, heft mîlyon, heşt mîlyon, neh mîlyon
du mîlyar, sê mîlyar, çar mîlyar, pênc mîlyar, şeş mîlyar, heft mîlyar, heşt mîlyar, neh mîlyar

Tewanga hejmarnavan

ji yekê, ji duyan, ji sêyan, ji çaran, ... ji hevdehan, ji hejdehan, ji nozdehan
ji bîst û duyan, ji bîst û sêyan, ... ji neh sed û heftan, ji hezar û pêncan
bi du zêran, bi sê dolaran, bi hevdeh beşdaran, bi nozdeh hespan
ji bîstî, ji sihî, ji çilî, ... ji heştêyî, ji nodî, ji sedî, ji hezarî, ji mîlyonî, ji mîlyarî
bi bîst zilamî, bi sih xwendekarî, ... bi mîlyon zilamî, bi mîlyar dolarî
ji bîst û yekê, ji çil û çaran, ji sed û çilî, ji hezar û yekê, ji hezar û çaran
ji sê hezaran, ji çar hezaran, ... ji hejdeh hezaran, ji nozdeh hezaran
ji bîst hezarî, ji sih hezarî, ... ji heştê hezarî, ji nod hezarî, ji sed hezarî
ji du mîlyonan, ji sê mîlyonan, ... ji hejdeh mîlyonan, ji nozdeh mîlyonan
ji bîst mîlyonî, ji sih mîlyonî, ... ji nod mîlyonî, ji sed mîlyonî
ji du mîlyaran, ji du trîlyonan, ji du trîlyaran, ... ji du kentîlyonan, ji du kentîlyaran
ji bîst mîlyarî, ji bîst trîlyonî, ... ji bîst kentîlyonî, ji bîst kentîlyarî
ji yek jinê, ji yek kurî, ji yek zilamî, ... ji nod û yek mêvanî, ji sed û yek mêrî
ji yek û nivê, ji du û nîvan, ji deh û nîvan ... ji çil û nivî, ji pêncî û nivî
ji niv dolarî, ji niv îsotê, ji niv karî, ... ji niv şekirî, ji niv xwarinê, ji niv zebeşî

Li gel hejmarnavên bi reqeman
sala 60î, ji 17an, ji 21ê
hejmara 100î, ji 1000î, sala 1945an, gulana 1639an
Nivîsîna îzafeyê: yekê gulanê, yekê mehê, yekê şevê
duyê mehê, sêyê mehê, çarê mehê, pêncê mehê
çarê şevê, çarê gulanê, çarê nîsanê
pêncê adarê, şeşê nîsanê, heftê gulanê, heştê hezîranê, dehê tebaxê,
Hejmarnavên rêzîn: beşê duyan, mirovê sêyan, ... sala sedî, sala hezarî
yekem, duyem, sêyem, ... nehem, dehem, yazdehem, duwazdehem, sêzdehem
çardehem, panzdehem, ... nozdehem, bîstem, sedem, hezarem
Nîşana dehekîyê bêhnok (,) e. Nimûne: 0,75
Ev (%) nîşana sedekîyê ye. Nimûne: % 35 Xwendina wê: ji sedî sih û pênc

Nivîsîna hejmarnavên dabeşî
1/2 ji duyan yek (duyek), nîv
1/3 ji sêyan yek (sêyek)
1/4 ji çaran yek (çaryek)
1/5 ji pêncan yek (pêncyek)
1/6 ji şeşan yek (şeşyek)
1/7 ji heftan yek (heftyek)
1/8 ji heştan yek (heştiek)
1/9 ji nehan yek (nehyek)
1/10 ji dehan yek (dehyek)
2/4 ji çaran du (çardu)
3/5 ji pêncan sê (pêncsê)

Nivîsîna peyvên duhejmarnavî

du sê kes
sê çar mirov
neh deh zilam
deh panzdeh roj
bîst sih karker
çil pêncî sal

Reqemên romayî

I = 1	XI = 11	XXX = 30
II = 2	XII = 12	XL = 40
III = 3	XIII = 13	L = 50
IV = 4	XIV = 14	LX = 60
V = 5	XV = 15	LXX = 70
VI = 6	XVI = 16	LXXX = 80
VII = 7	XVII = 17	XC = 90
VIII = 8	XVIII = 18	C = 100
IX = 9	XIX = 19	D = 500
X = 10	XX = 20	M = 1000

Nivîsîna tarîxê

roj.meh.sal	21.03.2011
di bîst û yekê adarê da, di sala hezar û neh sed û heftê û çaran da	
Di sala 1975an da	
Tewang di nivîsîna salê da: di sala 1914an de, di sala 1920î de, di sala 1870yî de	

Nîşandekên xalbendîyê:	
navber	
. xal	
, bêhnok	
; xalbêhnok	
: cotxal	
... sêxal	
? pirsnîşan	
! bangnîşan	
“ ” dunik	
‘ ’ yeknik	
” ducarek	
’ apostrof	
- bendik	
– xêzik	
() kevanek	
[] goşebend	
{ } kevanbend	
/ xwarexêz	
* stêrk	
çikexêz	
_ jêrexêz	
’ aksana akut	
` aksana grav	

Di nivîsînê da, di van rewşan da navber divê:	
Piştî her nîşandekêka xalbendîyê:	Gelo tu dê biçî malê? Qelem, defter, boyax û mase lazim in.
Di navbera hemû bêjeyan da:	Ez ji malê derketim.
Di navbera grûpên reqeman da:	2 500, 12 45, 212 345, 1 212 245
Piştî nîşandekê sedekî (%) û hezarekî (‰):	% 35, ‰ 250
Piştî nîşandekê paragrafê:	§ 1

Di nivîsînê da, di van rewşan da divê navber nebe:

Di navbera nîşandeka dereceyê û “C”yê da: 39 oC

Di navbera nîşandeka dereceyê û reqema tenîsta wê da: 180o

Di navbera reqem û tîpên bilindkirî û reqem û tîpên normal da: 25 km², 2-1, yn

Di navbera reqem û tîpên daketî û reqem û tîpên normal da: H₂O, X₂ – X₁

Navber nakeve nav nîşandekên mîna (), [], {}, “ ”, ‘ ’ û nivîsa nava wan.

Di nivîsînê da, di van rewşan da xal dihê bikarînan:

Li dawîya komekan: Komara Mehabadê di 1946an da hat avakirin.

Li dawîya kurtkirinên birî: astrol. (astrolojî), prof. (profesor), C. Bedirxan

Di nivîsîna tarîxê da, di navbera roj, meh û salê da: 21.03.2012

Piştî reqema sernivîs û beşan: 1. Bajarên Kurdistanê 2. Çemên Kurdistanê

Di matematîkê da ji bedêla carekê (nîşana carandinê): 5.5=25

Di karên komputeran da di navbera navên dosyayan: .bat, .doc, .exe, .jpg, .pdf

Di navbera beşên navnîşana Înternetê da: <http://www.europarl.europa.eu>

Di navbera beşên navnîşana posteya elektronîk da: malu@un.org

Bêhnok di van rewşan da dihê bikarînan:

Di navbera bêjeyêndi komekekê da ku li dû hevûdin rêz bûne.

Ez dê şîr, penîr, rûn, mast, hingiv û helawê bikirim.

Di navbera beşên (hevokên) komekekê yên sereke da.

Ew serê sibehê radibe, serûçavê xwe dişo, taştêya xwe dixwe û diçe karê xwe.

Di navbera hevoka sereke û ya nesereke da.

Wî bangî min kir, hingê min ew dît.

Piştî hevoka nesereke.

Heger tu rastîyê bixwazî, ez ji te bawer nakim.

Di xîtabkirinê da.

Gelî keç û xortên kurdan, hûn hemû bi xêr biçin.

Gava ku du frazên navdêrî li dû hevûdin bihên û yek ya din biwesiffîne.

Mêrdîn, bajarê li pala wî çiyayî, êdî her bi pêş ve diçe.

Piştî bêjeyekê yan jî qalibekî derbirînê yê ku komek pê dest dike.

Erê, ez wî nas dikim.

Di navbera navê cihan û tarîxê da. **Wan, 21.03.2012**

Ji bo dîyarkirina tixûbê salîseyê. **6.25.45,24**

Ji bo nîşandeka dehekîyê.

Bêhnok di van rewşan da nahê danîn:

Bêhnok ne berî bêjeya “jî”yê ne jî piştî wê dihê danîn.

Ez tevî nehatina te jî dîsan ji te nexeyidîm.

Bêhnok ne berî “ku”ya gihanek ne jî piştî wê dihê danîn.

Ez hatim wê derê ku te û hevalan bibînim.

Azad dibêje ku Dilşa dersa xwe dixwîne.

Xalbêhnok ;

Gava ku danîna xalê zêde xurt, ya bêhnokê jî zêde kêm bihê dîtin, di navbera beşên komekê da xalbêhnok dihê danîn.

Gava ku em çûn, ji gundê me Evdo, Azad, Filît û Roşan; ji gundê kirîvên me jî Qado, Mîran, Botan û Hesên li wê derê bûn.

Gava ku hejmarên dehekî li dû hevûdin bihên rêzkirin, di navbera wan da xalbêhnok dihê danîn: **3,14; 3,5; 4,25; 6,15**

Bêjeyên wekî navên kesan ku her dem bi girdekan dest pê dikin ne tê da, piştî xalbêhnokê hûrdek dihê.

Piştî xalbêhnokê divê ku navber hebe.

Di van rewşan da cotxal : dihê bikarînan:

Piştî hevoka ku ravekirin bi dû wê da dihê

Di qanûna nû da tiştê baş ev e: Ji roja qebûlkirina qanûnê pê ve, ew girtî dê bihên berdan ku hîn saleka wan maye.

Berî veguhastin û axaftinê

Binefşê bi sê dangan bang kir û got: “Lo lo rebeno, sibe ye, em dê dereng bimînin.”

Berî tiştên heman kategorîyê ku li dû hevûdin dihên rêzkirin.

Di lîsteya kirînê da ev hene: rûn, penîr, şekir û hingiv.

Di navnîşana Înternetê da piştî “http”yê û berî cotxwarexêzan // **http://www.kurdlib.org**

Di derbirînên hejmarî da, Di pîvanên nexşeyan da **1:100 000**

Di belgeyên fermî da, di navbera tarîxa salê û hejmara belgeyê da **2009:600**

Di matematîkê da ji bo parvekê (nîşana parvekirinê) **25:5=5**

Ji bo dîyarkirina tixûbên saet, deqîqe û sanîyeyan **6:25:45**

Ji bo rewşên ku bêjeya piştî cotxalê bi girdekê dihê nivîsîn.

Di van rewşan da sêxal ... dihê bikarînan:

Li dawîya komekên neqedîyayî. **Gava ku ez wî bibînim, ez dê jê ra ...**

Birîna di nava komekê da. **Min ji wî lawê kû... ra got.**

Birîna di bêjeya herî dawî da. **Ew bû hevalê wî lawê kû...**

Gava ku bêjeyek yan beşekî hevokê nehê nivîsîn.

Gava ku min ew dît, ez rast çûm ba wî ...

Sêxala ji bo beşên nivîsandî, çêdibe ku di nava goşebendê yan jî du xwarexêzan da jî bihê danîn. **Xanîyekî pir mezin [...] bi mîmarîya kevin [...] hat avakirin.**

Di jêwergirtinan da, ji bo beşên destpêkê, yên navîn yan jî yên dawî yên ku nehatine veguhastin.

Begê min, Ehmedî li ser wê got; “... berê xwe da wî cihê ... ji bo xwe ...”

Pirsnîşan ? ew nîşandek e ku di nivîsê da piştî pirsan dihê danîn.

Li dawîya komeka pirsê. **Navê te çi ye?**

Di dawîya wan bêje yan jî komekan da dihê danîn ku armanca wan pirskirin e lê ne bi awayê komekên pirsê hatine avakirin. **Navê te?**

Ji bo cih, dem, tarîx û rewşên ku nahên zanîn yan jî rewşên ku mirov ji wan ne ewle ye, dihê bikarînan.

Gava ku pirsnîşan di nava kevanekê da bihê danîn, divê ku di navbera kevanekê û bêjeya pêwendîdar da navber hebe.

Navê xanima ku li te pirsî, Binefş (?) bû.

Gava ku pirsnîşan bi tenê bihê danîn.

Kalê min di 1890?–1952yan da li Dinêserê? jîyaye.

Bangnîşan !

Bangnîşan piştî baneşanan û komekên baneşanîyê dihê danîn.

Gelî beşdarên qedirbilind!

Ji bo tinazpêkirin, piçûkxistin, heyirîn û hwd dihê bikarînan.

Xwedê wî bihêle, yekê pir bîaqil (!) e.

Di destpêka nameyê da, piştî bêjeya xîtab yan silavdanê bangnîşan dihê bikarînan. **Birayê min yê hêja!**

Dunik “ ”

Ev nîşandek ji du beşan pêk dihê û ev her du bi hevûdin ra nîşandekê pêk diînin.

Divê ku di navbera her du beşên dunikê û nivîsa hundirê dunikan da navber tune be (bnr. beşê “Navber”ê).

Celadet Bedirxanî di 15ê nîsana 1941ê da dest bi weşandina “Bingehên Gramêra Kurdmancî”yê kir.

Dunik li pêşî û paşîya wan bêjeyan dihên danîn ku ji kes yan jî nivîsên din hatine wergirtin.

Celadet Bedirxan ji bo dunikan weha dibêje: “Dunik dikevin pêşî û paşîya wan pirs û komekên ko mirov wan ji derve ditîne û têxe qisetê.”

Gava ku behsa navê nivîsekê dihê kirin, ya baştir ew e ku ew nav di nava dunikan da be.

Osman Sebrî di nivîsa xwe ya “Çiyayê Sasonê” da behsa hevdeh eşîran dike.

Gava ku mirov bixwaze balê bikişîne ser bêjeyekê, derbirînekê û nîşan bide. **Dibêjin ku 17 000 “kujernediyar”ên me hene.**

Ji bo bêjeyeka nû, derbirîneka nû yan jî bêjeyeka bîyanî dunik dihên bikarînan.

Dibêjin ku Arşîmedesî ji nişka ve gotiye; “eureka” û ji hemamê ber bi derveyî ve bazdaye.

Cih û prensîpên bikarînanana yeknikê ‘ ’

ji bo nîşankirina jêwergirtina ku di nava jêwergirtinekê da ye yeknik dihê bikarînan.

Mamostayê me got: “Min li Şamê zilamek dît. Piştî ku wî fam kir bê ez neviyê kê me, got: ‘Kalê te mêrxasekî mezin bû’ û bi dû wê gotinê ra ez hembêz kirim.”

Divê ku di navbera her du beşên yeknikê û nivîsa nava yeknikan da navber tune be.

Ducarek ” nîşandeka ducarekirinê ye.

Nav	Bajar
Berfîna Xelîlî	Semsûr
Elîyê Miradî	”
Hêlîna Dilşayê	”
Mihemedê Xezalê	”

Apostrof ’

Gava ku tîpeka bejeyekê nehatine nivîsîn, di şûna wê tîpê da nîşandeka apostrofê dihê danîn.

“Çu j’dest nedihat û maye aciz” (Ehmedê Xanî, Mem û Zîn)

“Te j’ min dil bir carek mi j’ te r’ nego na” (Cegerxwîn, Agirê Evîndarî)

Piştî navdêrên taybetî û hejmarnavan apostrof nahê danîn:

Weha binivîse	Weha nenivîse
Ez ji Dêrsimê hatim.	Ez ji Dêrsim’ê hatim.
Ez ji Kurdistanê me.	Ez ji Kurdistan’ê me
di 16ê tîrmehê da	di 16’ê tîrmehê da
di sala 1979an da	di sala 1979’an da

Bendik -

Bendik ji bo pevgerêdana parçeyên bêjeyan yên cuda dihê bikarînan ku di rêzên cuda da hatine nivîsîn.

da-	da-	hil-	ne-	ve-	vê-
weşîn	xistin	dan	mir	qetîn	ketin

Ji bo nîşandana morfemên bêjeyekê. **da-weş-în hil-dan**

Di komekekê da ji bo destpêk û dawîya bêje yan jî hevokên navberê.

Ez par çûm Honyarayê -paytextê Giravên Salomonê ye- û ez li wê derê sê mehan mam.

Di rêzimanê da ji bo nîşandana pêşgir û paşgiran.

paşgir-ane -bar -ek -van

pêşgirda- hil- ra- ve-

Di rêzimanê da ji bo nîşandana kîteyên bêjeyan. **xwen-din, ni-vî-sîn, a-gah-dar**

Hin caran bi maneya “û”yê dihê bikarînan.

Di salên 70yî da gelek kes marksîst-lenînîst bûn.

Ji bo peryod û mesafeyê. **Dirêjîya rêya Dîyarbekir-Pîranê 92 km ye.**

Di hejmarên bankcîro û postcîroyê da. **Bankcîro: 255-4038 Postcîro: 213445-2**

Di hin navdêrên taybetî yên bîyanî da. **Île-de-France Rosina Bulwer-Lytton**

Xêzik –

Ji xêzikê ra xêzika axaftinê jî dihê gotin. Xêzik ji bendikê dirêjtir e.

Di nivîsîna demê da: **Pirtûkxane di saet 12–18an da vekirî ye.**

Di encamên pêşbazîyan da: **2–1**

Di navbera hejmara telefonê û koda bajarî da: **0482–313 23 23**

Kevanek ()

Kevanek ji bo wan ravekirinan dihê bikarînan ku tu têkilîyeka wan bi avahîya komekê ve tune ye. **“Belayê (wê nexweşiya xedar) ez gelekî êşandim.”**

Xal, bangnîşan û pirsnîşan piştî kevanekê dihên danîn.

Ew çêlikê maran e (bêjehr nabe).

Heger komeka nav kevanekê hevokeka serbixwe be, xal, bangnîşan û pirsnîşan di hundirê kevanekê da dihên danîn.

Ez dê sibehê biçim malê. (Gelo Şêro jî dê bê?) Şêro ma tu dê li vê derê bimînî?

Ji bo navê nivîskarên gotar yan pirtûkan.

Min Şivanê Kurmanca (Erebê Şemo) di demeka kurt da xwend.

Li gel sêxala ji bo beşên jêwergirtinan yên nenivîsî.

“Ji rexê din dora kanî an kevîyên robaran bi spîndaran xemilandî ne. (...) Ji xwe ev spîndarên ha di lêkirina xaniyên wan da bingehekî mezin in.”

Ji bo bêjeyên hevmane, tarîx û pîvanên bergindên hevûdin dihên bikarînan.

Haya zikê têr ji yê birçî (birsî) tune ye. Firehîya golê 8 yard (nêzîkî 7,32 m) e.

Di nivîsên tîyatroyî da agahdarîyên di warê sehneyê da, her weha yên li ser rewşa tîyatroyerên û tevgerên wan jî di nava kevanekê da dihên nivîsîn.

Mamosta – Kurê min, rabe ser pêyan!

Gava ku bangnîşan ji bo tinaz, piçûkxistin, heyirîn û hwd dihê bikarînan, di hundirê kevanekê da dihê danîn. **Ka mêrxasê me (!) li kê derê ye?**

Gava ku ji bo nîşandana beş yan jî xalên nivîsekê, reqem yan jî tîp bi kar dihên.
reqem: 1), 2), 3) tîp: A), B), C); a), b), c)